

# Çîroka sê qonaxên pêvajoya wergerekê

## Hê

Min ew cara yekem li Fuara Tuyapê ya pirtûkan ya 1998an, gava ez di nav xwendevanan, bikiran, kesên ku pirtûk didan ser hev, kesên ku sirf ji ber miraqa xwe hatibûn wira, kesên ku bi destên hezkiriyên xwe girtibûn û ew anîbûn "fuara pirtûkan", dizekên ku çavên xwe li dora xwe digerlandin û difikirîn bê wan ê kîjan pirtûk ji kîjan standê bidizîyana û bibirana; rojnamegeran, nivîskaran, weşangeran û xwendekarên ku mamosteyên wan ew anîbûn wê deverê de ji pêlikan dadiketim qatê jêrê û min hewl dida ku ez li bin guhê kesên derdiketin jorê nekevim ku ew jî mîna wanên ku bi min re dadiketin bûn, li ser afîşa wê ku di nav gelek afîşên din de bi dîwarekî ve hatibû zeliqandin dît. "Navê Min Sor e."

Hin roman an jî berhemên din hene, mirov dikare ji navê wan tê derbixe bê behsa çî dikin. Weke "Notre-Dame de Paris" û "Sefîl"ên Hugo, "Anna Karenîna" û "Şer û Aştî"ya Tolstoy, "Malbata Karamazovan" a Dostoyevskî; "Şivanê Kurd"ê Erebb Şemo, "Mem û Zîn" a Ehmedê Xanî. Lê ev ne weha bû. Ji bilî "Sor" a "Navê Min Sor e" tiştêkî din ku bala mirov bikişandaya ser mijarekê, tunebû. Sora yekem ku bi dîtina vî navî re hate bîra min, sora "polîtîk" bû; ya din jî "sora ku kurdan jê hez dikir" bû ku me li ser wê digot "bila sor be û bila pênc wereqeyên wê zêde be." Lê hêleke din di vî navê ku ji bo romanê hatibû hilbijartin de hebû ku ez ê bi dû re lê hay bibûma. "Sor" bi xwe dipeyivî di vê hevokê de.

Meh û nîvek bi ser wê roja ku min ew dîtibû de ketibû. Êvareke Stembûlê ya sar wek seqemê, bayekî kur dihat ku porê min û atqîya min bi wir de û bi wê de belav dikirin, ji weşanxaneyê derketibûm û di bin baraneke weha de ku wê bi xwe jî nema zanîbû bê dibariya an na, di nav qelebalixîya kolana Istîklalê de, di ber rayên tramwayê ku bi şewqa lempeyên Beyoglu yê ku carê vêdiketin û vedimirîn dibiriqîn re, di ber wîtrînên nivîsandî û boyaxkirî yê kincfiroş û solfiroşan re ku nîşana nêzîkbûyina sersalê bûn, di ber deriyên pasajên ku dengê stranên tev li hev dibûn û ji wan derdiketin derve re, ji bo ku xwe bigihînim malê, ber bi meydana Taksîmê ve diçûm. Carekê ji ber qemyoneke ku li ber deriyê pitûkfiroşê ku rojê hema carekê be jî ez diçûmê û min bala xwe dida pirtûkên ku nuh derketibûn sekinîbû, ez mecbûr mam ku derbasî wî alîyê rêyê yê din bibim. Du zilamên ku kincên karkeran li wan bûn, pakêtên ku ji qemyonê dadixistin dibirin hindurê dikana pirtûkfiroşî. Gava min ji pirtûkfiroşî pirsî, ez hîn bûm ku "Navê Min Sor e" derketibû û hê wê şevê dest bi belavkirina wê hatibû kirin. Bi vî awayî jî ez dibêjim qey ez bûm bikirê wê yê yekem.

Kê nîvîskar hebûn ku min sirf ji bo navên wan berhemên wan dikirîn û dixwendin ku Orhan Pamûk jî yek ji wan bû. Di salên ku min li zanîngehê mamostetîya edebîyatê dixwend de, tê bîra min ku mamosteyên me yê ku niherîna wan ya li edebîyatê û ilhes jî ya li romanên qet nediket serê min û digot qey hema mirov xazelan ji ber bike tamam e, hey digot "biniherin, nivîskar di vê romanê de behsa gundîyan dike", û nizanîm "behsa evîna xortekî xizan û keçeke dewlemandan dike" an jî "cudayetîya di navbera jiyana gundan û ya bajaran de" an jî "cudayetîya di navbera rojhilatê û rojavayê de" an jî "navkokiyên

rewşenbîran" û hey pesinên wan didan. Wê demê jî ji "behsa çi dike" bêhtir, min bala xwe her dida "çawa behs dike."

Divê "nûbûnek" û "cudabûnek" hebûya di vebêjeriyê de. Ji ber vê yekê, tê bîra min ku min û hevalên xwe gelekî gotûbêj kiriye.

Ji "Decameron" a Boccaccio û "Don Kişot"ê Cervantes û bi vir ve hunerê romanê ew qas pir "nûbûn" û "cudabûn" dîtine ku niha ji nav wan nivîskaran bi tenê yê ku pêşengîya "nû"yan kiriye mane di bîra min de. Ji nav nivîskarên demên modern yê mîna Marcel Proust, James Joyce, Virginia Woolf, William Faulkner; di romana tirkî de jî yê mîna Ahmet Hamdî, Yaşar Kemal, Oguz Atay, Wedat Turkalî û Ferîd Edgu. Orhan Pamûk jî tim wekî yekî ku dabe pey "nûbûn"ê û "cudabûn"ê mabû di bîra min de. Di nav romanên wî de yek jî naşibe yeka din. Bi tenê taybetîyeke wan heye. Giş "nû û cuda" nin û tu dibêjî qey ilhes jî sirf ji bo ku weha bin wî serê xwe bi wan re êşandiye. Nemaze jî di "Pirtûka Reş" û di "Navê Min Sor e" de. Di herdu pirtûkan de hin nivîsar henin ku mirov dibêje qey tu têkîlîya wan bi naveroka romanê re tune ye lê ya esil ew roman bi wan nivîsaran xweş bûne. Gelek kesan ji ber ku ji ew nivîsar fahm nedikirin û nikarîbû bigotaya bê ji bo çi weha weke pîneyan dixuyan, ji bo ku vê nezanbûna xwe veşêrtaya hema digot "nivîsarên gelekî xweş" û di ser guhên xwe re diavêtin. Lê yê min, min tim dianî ber çavên xwe bê gava ew nivîsar dinivîsandin Orhan Pamûk çawa kêf dikir û şa dibû. Gava mirov "Cevdet Beg û Kurên xwe", "Xaniyê Bêdeng", "Keleha Spî", "Jiyana Nû" û "Rûyê Veşartî" jî, veya dawîn senaryo ye, deyne cem wan herdu romanên ku me behsa wan kir, xusûsiyetên nivîskariya Orhan Pamûkî ji xwe ber derdikevin holê: Stembol, dîrok, zanîneke weha ku bi tenê lêkolînerê jîr dikare bi dest bixe, cihaneke xeyal û fantaziyan ya fireh, lixwegerîn û lêgerîneke bêdawî, şewazeke îronîk û polîsiye, romannivîskariyeke nû ku mirov li xwe ecêbmayî dihêle.

Di salên ku min li Sultanahmetê mamostetî dikir de ji bo ku ez lêkolînê, bipêşdebirin û firehkirina xeyal û fantaziyan û bikaranîna wan, gava mirov behsa bûyereke kir jî cudabûnê û nûbûnê bi şagirtên xwe bidime fahmkirin û hezkirin, çend nivîskar hebûn ku min pêşniyarî wan dikir ku Orhan Pamûk di serî de dihat.

"Navê Min Sor e" yekser dika "meddah"an e, qahwexaneyê weha ye ku ji her taxê û ji her şiklî însan tîne, tevlihevîyeke ecêb, şerekî mezin, lîskeke bikêf, daweteke qereçyan. Jîndar û nejîndar hema herkes û hertişt dipeyive di vê romanê de, Şeytan radibe behsa xwe dike û xwe li hember êrişên ku heta niha li wî hatine kirin diparêze, Jin dipeyive û xwe li hember bêbextîyan diparêze, Peryekî ku belkî di demeke dîrokê de ji kîsikê bazirganekî ketibe behsa çîroka gera xwe dike û Hesp, Kûçik, Dar, Herdu Evdal, Mirin û Sor bi xwe, her kê çîrokên xwe dibêjin û romanê tevlihevtir dikin. Di nav vê tevlihevîya ku bi her çîrokeke tevlihevtir dibe de, teva tevlihevîya jîyanê bi xwe, Orhan Pamûk romanêke dîrokî ya nû diafirîne.

Di romanê de bi emirê Siltanê Osmanî û ji aliyê Zava Efendî ve bi dizî pirtûkeke "nihênî" ku li gora usûla Wenedîkiyan e tê amadekirin. Vê pirtûka ku berê her neqqaşek wêneyên ku ew bi xwe jî nizanin bê dê têkevin kîjan pirtûkê çêdikin dest pê dike û Zava Efendî ji Reşoyî dixwaze ku çîrokên wan binivîsîne, hê nû gava ku Şekureya keça Zava Efendî hemû not û wêneyên ku ji bavê wê û Reşoyî mane dide kurê xwe Orhan, dibe "Navê Min sor e" û derdikeve pêşberî me. Hin kes dikarin bibêjin "ma ji bo çi kesên ku têkîlîya wan bi bûyerê re tune ye dipeyivin? Çi têkîlîya Şeytên an jî Darê an jî Hespî bi vê romanê re heye?" Orhan Pamûk bi xwe, di romanê de bersiva vê pirsê ji devê Zava Efendî dide. Zava Efendî ji Reşoyê ku dê bi dû re bibe zavayê wî re weha dibêje:

"Eyn wek ku te li Tebrîzê bi xetat û neqaşan re dikir, min jî pirtûkek dida çêkirin. Siparîşdarê min Hezretî Padîşahê me yê bingehe alemê ye. Ji ber ku

pirtûk nependî ye, Padîşahê me ji bo min bi serekxeznedar pereyekî nihênî dabû derxistin. Min bi neqaşên neqaşxaneyê Padîşahê me yê herî hoste re, yek bi yek li hevdu kir. Min bi hinan resimê kûçikekî, bi hinan ê darekê, bi hinan xemlên kenaran û resimê ewrên di asoyî de û bi hinan jî yê hespan didan çêkirin. Min dixwest ku tiştên ku min resimên wan didan çêkirin, eyn wek resimên hosteyên wenedîkî, hemû alema Padîşahê me temsîl bike. Lê ev dê ne wek yê wenedîkiyan resimên mal û milkan bin, ew ê resimên dewlemendiya hindurîn û kêf û tirsê alema Padîşahê me bin. Ger min resimê pereyî dabe çêkirin, ev ji bo piçûkdîtîne ye. Min Şeytan û mirin jî ji ber ku em ji wan ditirsîn xistinê. Ez nizanim bê xelk çi dibêjin. Min xwast ku nemirîya darên wî, betilbûna hespên wî û bêarîya kûçikên wî, Hezretî Padîşahê me û alema wî temsîl bikin.”

Ew pirtûka ku behsa wê tê kirin, “Navê Min Sor e” ye, lê ji nû ve ji aliyê Orhanê lawê Şekureyê û neviyê Zava Efendiyî ve tê nivîsandin. Resimê temam bûne, Reşo çîrokên wan dinivîsîne lê weke ku Şekure di beşê dawîn de dibêje ji ber ku Zava Efendî tê kuştin û Reşo jî piştî ku bi Şekureyê re dizewice dev ji temamkirina pirtûkê berdide, pirtûk tu carî temam nabe û ji ber wê bi hêviya ku Orhan wê pirtûkê biqedîne, piştî mirina Reşoyî, çi agahiyên wê li ser van bûyeran û not û name hebin dide Orhanî.

“Min bi mebesta ku belkî lawê min Orhan binivîse, ev serpehatîya ku resimê wê nikare bê çêkirin, ji wî re vegot. Heçî nameyên ku Hesên û Reşoyî ji min re şandibûn û resimên hespan ên hibira wan belav bûbû ku **bi** Zarîf Efendiye belengaz **re derketibûn**, bêtî ku ez tekevîm duduliyê min ew dan wî.”

Di romanê de ji dêleva nivîskêr, leheng dipeyivin û bûyeran vedibêjin. Nivîskar jî mîna xwendevanan xwe dide bende wan û qet jî bela xwe ji wan nayne. Ji bilî wî herkes dipeyive û roman bi vî awayî beyî ku ew tev lê bibe hatiye nivîsandin. Vî awayê vegotinê ku Wiliam Faulkner jî berê di romana xwe ya bi navê “Gava Li Ser Doşeka Xwe Dimirim” de bi kar anîbû û berê vê romanê ji aliyê Ferîd Edgu ve di romana bi navê “Havîneke di bin siya Îlonê de bû” û çîroka bi navê “Nêçîr” de hatibû ceribandin, bi vê romanê bi awayekî hostehî di romana tirkî de şûna xwe zêft dibe.

Orhan Pamûk, gava ku romanekê dinivîsîne ji xwe re dilîze, henekên xwe bi xelkê dibe û mîna zarokan kemînan li ber wan datîne. Di beşê yekem ku navê wî “Ez Mirî mim” de ji bo ku qesase wî bê peydekirin ji devê Zarîf Efendî peymanekê pêşniyarî xwendevanan dibe:

“Heta ku ew rezîl neyê peydakirin, ger min têxin gora herî şahane jî divê hûn zanibin ku ez ê di gora xwe de, di bêhizûriyê de xwe bi vî aliyî de û wî aliyî de biqulipînim û bipê. Û ez ê bikim ku hûn dev ji bawerîya xwe berdin. Hûn qesase min, wî lawê qehpikê peyda bikin, ez ê jî ji we re yek bi yek behsa hemû tiştên ku ez ê li dinyaya din bibînim bikim!”

Bi vî awayî Zarîf Efendî têra xwe hêrs dibe û xeberan dide, lê her ku ew hêrs dibe Orhan Pamûk bêhtir şa dibe. Piştî vê jî elbet ev hevok peyda dibe:

“Lê piştî ku we qesase min peyda kir, divê hûn bi mengeneyê şikenceyê lê bikin, neh-deh hestiyên wî, nemaze hestiyên wî yê sîngê hêdî hêdî qirpîniyê jê bînin û bişkînin, bi dû re jî bi şîşên şikencekaran ên ji bo vî karî hatin çêkirin, çermê serê wî qul bikin û wî porê wî yê pîs î birûn ta bi ta rakin.”

Bi vî awayî heta ji hêrsa lehengê xwe jî destkewtî dibe û lê dikole bê mirov çawa dikare canê yekî biêşîne û her weha kêfê jê werdigire. Çi gava fersendê bi dest bixe jî kemînekê misoger vedide. Qey ji ber wê ye ku li ser berga romanê ya paşiyê ji dêleva “deh” rojên sala 1591ê yê biberf, “neh” rojên 1591ê daye nivîsandin. Hela hûn dev ji wan çîrok, efsanê û bûyerên li ser neqqaşiyê ku her yê ku dipeyive yekê lê zêde dibe û mirov dibêje qey rast in an jî li derekê hatine nivîsandin ku wî ew ji xwe ber li hev anîne berdin. Lê belê, Orhan Pamûk dizane

ku romannivîsî ne ew qasî hêsan e û ji lewre, her tîp, leheng, cîh, bûyer û tiştên ku dê têxe romana xwe bi baldarî hildibijêre. Di romaneke weha ku behsa Stembola sala 1591ê dike û bi kuştin, entrîqa û evînên ku li derdora neqqaşxaneyê siltanê osmanî digerin berfireh dibe de ji bo bi nameyên ku di navbera lehengan de diçe û tê eşkerekirina bûyer û hîssên ku veşartî hatine hiştin, ji têkîlîya "Estera Yahûdî" û "Hesenî" çêtir nikarîbû mifteyêke din bidîtaya. Gava min ew ji wî re got, ji min re got "li Stembola wê demê, min nikarîbû behsa evînekê bikira ku yeka weke Ester tê de nebe." Lêkolînêriya Orhan Pamûkî jî di vira de dest pê dike. Estera ku ji bo vê xusûsiyeta wî nimûneyêke baş e, dê nameyan bibe û bîne û carê jî ew ê tev li axaftinê bibe û em ê bûyerê carcaran jî ji wê guhdarî bikin. Ma qey Estera Buxçikfiroş dê tiştêkî nefiroşe? Difiroşe. Ma qey ew ê buxçika xwe li ber kasî danîne? Datîne. Ma qey ew ê malên buxçika xwe yek bi yek nepesinîne û behsa wan neke? Belê, yek bi yek dihejmêre û pesinê wan dide:

"... ger min hingulîsk, guhar, gerdenî û bi qasî ku kelecane bi pîrekan re çêbike, cîncoq mîncoqên ku hem erzan û hem jî biha xistin nav destmalên hevirmêş, lepik, çarşef, qutikên rengîn ên bi keştîya Portekîzê hatibûn, ez radihêjim buxçika xwe û li Stenbûlê qul bi qul digirim; kolana ku ez naçimê namîne."

"Buxçikfiroş hat, buxçikfiroş! Dolbendên min ên reqsbendî yê pir xweşik henin ku layiqî Padîşahî nin; şalên min ên pir delal henin ku ji Keşmîrê hatinin, şûtikên min ên ji qedîfeyên Bursayê henin, ji bo qutikan cawên misirî yê dora wan hevirmêşî henin ku di ser wan re tune ye, rûberên min ên dolbend ên neqîşkirî henin, rûyên doşekan û çarşefên min, destmalên min ên rengorengo henin, buxçikfiroş hat!"

"Jinên qizilminareyî û qerekediyî ji bo rûyê lihêfan cawê Bilecîkê, qumaşê binefşî û sor xwestibûn, min ew ji serê sibehê de xistin buxçika xwe. Min qumaşê kesk ê hevirmêşê çînî danî ku ji keştîya Portekîzê ya nuh hatibû derketibû û min şînê wî xist buxçika xwe. Ji ber ku ew berfeke qedandin lê tune bû û zivistaneke bêdawî bû, min gelek gorên rîs, şûtikên rîs ên stûr, çapikên hirî yê qalind ên rengên cuda cuda jî xweşik pêçan û xistin ortê, da gava ez buxçika xwe vekim, ji heyecana dilê jina ku kirîna tiştêkî qet di dilê wê de tune be jî bike gurpegurp."

Madem ku li Stembola wê demê, beyî Esterê mirov nikare behsa çîrokên evîne bike, divê mirov hemû xusûsiyetên jineke weke Esterê jî temam bike. Orhan Pamûk jî weha kiriye û çî xusûsiyetên Esterê hebin, elbet yê ku ji wî û romana wî re lazim in, yek bi yek peyda kirine û xistine romana xwe. Ji ber ku ew baş dizane bê mirov di kîderê de dikare biafirîne û di kîderê de nikare biafirîne û elbet baş dizane çîroka xwe xweş bike û weha bike ku em bawer bikin. Weke ku dêya wî Şekure gava ku wêne û nivîsarên ku li cem wê ne dide wî, ji bo kurê xwe Orhan ji xwendevanan re dibêje:

"... gidî jê bawer nekin. Lewra ji bo ku çîroka wî xweş be û em jî jê bawer bikin, tu derewa ku dê nikaribe bike, tune ye."

## Waw

Ji ber sirgunên ku Trajedîya Kurdan ya Sedsala Bîstan em mecbûrî jiyîna wan kiribûn, heta sala 1997an jî têkîlîyeke serrast di nav min û Kekê Mistefa yê ku malbata me rûyê wî her di reşahiya êvaran de dîtibû û me yê piçûk jî ew ji wêneyên wî û dengê wî yê ku di telefonê de dihat me nas dikir pêk nehatibû. Di sala 97an de gava min dest bi nivîsandina romana xwe ya yekem kiribû, romana wî ya bi navê "Pêlên Bêrîkirinê" jî çap bûbû. Wê gavê ji ber rexneyêke ku min li

ser romana wî nivîsandibû û şandibû ji wî re, li min gerîyabû û pirsîbû bê min jî dinivîsand an na. Wê demê hayê me belkî jê tunebû, lê ew bûyer dê bibûya destpêka têkîlîyeke nû ji bo du birayên ku hevdu nedîtine û dê bi telefonan û e-maîlan xurttir bibûya. Du sal bi şûn de gava min romana xwe qedand jî min berî her kesî şandibû ji wî re. Ji xwe wê demê mirov nikarîbû yek peyda bikira ku karibûya berhemeke li ber çapê bixwendaya û binirxandaya. Bi vî awayî Mistefa bûbû mamosteyê min jî.

Her ji du-sê rojan bi carekê em bi telefonê bi saetan bi hevdu re dipeyvîn û me belkî ji malbata xwe pê ve behsa hertiştî dikir. Rojeke ku dîsa me behsa pirtûkên ku nuh derketibûn dikir, gava min ji wî re behsa "Navê Min Sor e" kir, ji min xwast ku ez wê romanê jî bi hin pirtûkên ku wî berê ji min xwastibûn re bişînim.

Du hefte bi ser neketibû ku min pirtûkên ku wî xwastibûn ji wî re şandibûn. Vê carê sirf ji bo "Navê Min Sor e" li min gerîya.

Got, "binihêre, Birahîm, camêr bi rastî jî xweş nivîsandiye," û rabû dest bi xwandina beşekê kir.

Min got, "Keko, min jî ew roman xwendiyê û ez dizanim bê Orhan Pamûk çi kêf ji nivîsandina wê wergirtiye."

Kenîya. Got, "hingê ka ez ji te re beşekî bixwînim ku te qet nexwendiyê," û dest pê kir û beşê yekem yê bi navê "Ez Mirî mim" bi kurdî ji min re xwand. Ez şaş bûbûm. Kêfa min gelekî ji kurdîya romanê re hatibû. Heke min berê tirkîya wê nexwendibûya û hayê min ji wê tunebûya, min ê bikarîya sûnd jî bixwaraya ku wî ew beş bi xwe nivîsandibû.

Gava lê niherî ku kêfa min jî jê re hatiye, mîna ku henekên xwe bi min bike, got, "çawa bû?"

Min jî hema ji nişka ve û bi pirsekê bersiva pirsê wî da.

"Ma qey tu werdigerînî kurdî?"

Gelo ew jî li bende vê pirsê bû, ez nizanim, got "na, lo; gava min xwend kêfa min jê re hat û min got hela bê ev bi kurdî bûya dê çawa bûya."

Min got, "Êêêê...?"

Got, "min jî hema rabû û beşek jê wergerand."

Bi dû re em dûdirêj li ser vê romanê û romannivîsiya Orhan Pamûkî peyvîn. Teknîk û hûnandina wî ya vegotinê kiribû ku kêfa me bêtir ji vê romanê re were. Belkî ne bi temamî "nû" bû ji bo me, lê "cuda" bû. Dîsa em hatin ser kurdîya wê.

Min got, "Keko, wellehîn gelekî xweş çêbûye, mirov bawer nake ku werger e. Heke Orhan Pamûk kurd bûya, wî ê jî ancax weha binivîsandaya."

Got, "Heke Orhan Pamûk kurd bûya, ma tu dibêjî kurdîya wî jî dê weha xurt bûya?"

Min hema ji xwe ber got, "nizanim" û hema bi fikireke ku ji nişka ve hate bîra min, min got "ev tu çima vê romanê wernagerînî? Bi vî awayî em ê karibin bersiva pirsê te jî bibînin. Ew ê çi xweş bibe."

Got, "ev ne ew qasî hêsan e, zimanê vî zilamî hebekî zehmet e."

Min lê niherî ku nabêje na, hema min jî zor dayê:

"Ez ê li ser navê te bi Orhan Pamûkî re jî bipeyivim. Ji xwe gelekê kurdan tirkîya wê xwandiyê, lê bi kurdî be tahma wê dê cuda be."

Got, "ez jî weha difikirim, lê divê em ji wî jî bipirsîn bê ka hela ew çi dibêje."

Bi dû re ji min re got, "hela tu bipirse, bi dû re em bipeyivin."

Roja din min bi rêya weşanxaneyê faksek şand ji Orhan Pamûkî re û got ku ez dixwazim "li ser kurdîya Navê Min Sor e" bi wî re bipeyivim. Piştî ku em carekê du caran bi telefonê peyvîn, ji bo ku ez herim mala wî û em bipeyivin civanek da min.

Li mala wî ya ku tengava Stembolê û giravên wê mîna tereheyekê li ber mirov radixist û mirov tê derdixist ku bi tenê ji bo nivîsandina berhemên xwe raxistibû, li salona ku dîwarên wê bi refikên ku heta ber dev bi pirtûkan hatibûn dagirtin seranser hatibûn pêçan û bi wî awayî dişibiya odeya Zava Efendîyê romanê ya xebatê û weke beşekî pirtûkxaneyê siltanê osmanî ku Reşo û Osman Hoste ketibûnê û ji bo ku delîlên kuştinan bi dest bixin sê rojan tê de mabûn dixuya, di germa nîvroya meha gulanê de ku bi bêhna deryayê hebekî sist dibû, qahweyên me di destên me de me dest bi peyvê kir.

Got, "ji bo min şerefek e" gava min ji wî re got ku em dixwazin romana wî wergerînin kurdî. Gava min jê re behs kir bê Mistefayî li ser zehmetîya wergera zimanê wî çi gotiye jî got, "gava min ew nivîsand min dît bê çi qas zehmet e, ji ber wê, ez baş dizanim ku wergera wî dê zehmettir be."

Bi dû re me behsa rewşa ziman û edebîyata kurdî û astengiyên li hember kurdî û gefên ku lê dihatin xwarin û tesîra van hemûyan ya li ser firotin û xwandina berhemên bikurdî kir. Ji ber ku ji berê de ji hin hevpeyvînan wî yê bi kovar û rojnameyên biyanî re û dengvedana van hevpeyvînan ya li Tirkîyeyê min zanibû bê li ser rewşa kurdan bi çi awayî difikirî, ez serbest dipeyvîm.

Pirsên mîna "ma piraniya xwendevanên kurd ji xwe ev roman bi tirkî xwendiyê; ger weha be ev yek dê tesîreke neyînî li firotina kurdîya wê neke?" weke ku em jî berê di nav xwe de peyvîbûn, bû mijara sohbetêke nû.

Min got, "li dijî kesên ku dibêjin "kurdî tune" em dixwazin alîkarîyê bidin kesên ku dixwazin zimanê kurdî bi kurdan bidin hezkirin û bikin ku kurd bi zimanê xwe jî bixwînin û di vê rêyê de beyî ku tu karê jê bikin her dixebitin û em dizwazin ku ev werger jî bibe xizmeteke di vî warê de."

Got, "hingê bila ev jî alîkarîya min ya bi kurdî be," û lê zêde kir:

"Ji bo vê yekê çi ji destê min were jî ez hazirim bikim. Ji bo min rûmet e ku romaneke min werdigere zimanekî mîna kurdî."

Ji bo romannivîsekî ku romanên wî li çar aliyên dinyayê têne firotin, li ser wergera vê romana xwe ya dawîn ku bi tenê li Tirkîyeyê ji sed û pêncî hezar libî bêtir hatiye firotin û li Fransayê ketiye nav deh pirtûkên herî bêtir hatine firotin û heke çapa wê ya kurdî ya duhezarlibî bête firotin dê bibe serkevtineke mezin, gotina "ji bo min rûmetek e", çi qas ecêb e ne weha? Ji bo kesên ku zimanên wan qet nehatine qedexekirin û li dûrê vê dinyaya ku em dixwazin fahm bikin û behsa wê bikin dijîn, fahmkirina vê yekê gelekî zehmet e. Lê Orhan Pamûkî jî mîna me dikir û bi vê helwesta xwe piştgirî dida kesên ku ji bo rê li ber wendabûna zimanekî bigirin her şer dikir.

## Yê

Aha weha dest pê kir wergera vê romanê. Bi dû re, min û Mistefa, me her piştgirî û moral da hevdu. Bi pirsên xwe yê mîna "tu niha di kîjan beşî de yî, tu gihîştî kîderê?" min ew mecbûr dikir ku her cara ku ez jê bipirsim ji min re bibêje ku werger hebekî din bi pêş ve biriye. Ji demekê û bi şûn de êdî wî bi xwe her gava ku xwe ji beşekî din an jî hevokeke din ku Orhan Pamûkî sirf li ser qehra wergêran zehmettir kiriye û mîna paragrafan dirêj kiriye û hûnaye an jî ji her çîrokeke din ku nizamim bê Orhan Pamûkî ji kû dîtiye û xistiye nava romanê ku karê wergêran zehmettir dikir xelas dikir, hê berî ku bêhna xwe beradaya li min digerîya û digot:

"Vî beşî mala min xera kir, lê hela ka guhdarî bike bê çawa çêbûye."

Êdî vê wergerê jîyanên me bi tamamî kiribûn êsîrên xwe ku me nema dikarî behsa tiştêkî din bikiraya. Me yek bi yek bala xwe dida hevokan û kîtekîtan. Di ber re jî me bala xwe dida nivîs û nixandî û rexneyên ku li ser vê romanê hatibûn nivîsandî. Carekê min nivîsek xwandibû ku digot "Orhan Pamûk di filan rûpelê de qesasê xwe dide dest." Gava min ev ji Mistefayî re got, wî got "dev jê berde lo; Orhan Pamûk bi xwe jî nizane bê li kîderê qesasê xwe dide dest, ji ber ku tu delîl di vê romanê de tunene." Bi dû re jî got, "ji xwe ez bawer nakim ku derdekî wî yê weha hebe, tew belkî ji bo ku qesasê xwe nede dest çî ji destê wî hatibe kiribe jî."

Dîsa rojekê piştî ku beşekî ku wergera wî zehmet bû ji min re dixwand, ez dibêjim qey beşa "Ez Hesp im" bû, ji min re got, "tu dizanî?" û lê zêde kir: "derdekî vî zilamî bi tenê heye, gava ku romanekê dinivîsîne, ji bo ku ew roman neyê wergerandin çî ji destê wî tê dike, divê mirov têra wî lê bixe; ez baş dizanim ku hemû wergêrên wî xeberan jê re didin."

Mistefayî berê jî Jack London (Zaroka Şevê, çîrok, Weşanên Nûdemê, 1995, Stockholm), Yaşar Kemal (Siltanê Fîlan, roman, Weşanên Nûdemê, 1998, Stockholm), Azîz Nesîn (Fîl Hemdî, çîrok, Weşanên Dozê, 1999, Stembol) û Anne Eriksson (Kurdistan, gername, swêdî - kurmançî - soranî, 2001, Stockholm) wergerandibûn. Di wergerên wî de tim bala min kişandîye ku ew ji nivîskarê pirtûkê bêhtir dixebitî. Di "Navê Min Sor e" de jî min ev yek dît. Orhan Pamûk bi salan li ser xebitîye, sê sal di ser çapkirina wê re derbas bûye, wergera wê ya gelek zimanan hatiye kirin, li ser wê bi qasî deh qatê giraniya wê nivîs hatine nivîsandî, lê Mistefa hê jî bi şika "gelo di vira de xeletiyek nehatibe kirin" bi pey hevokan û agahîyan diket û hey bala xwe dida mînyaturên hespan û diçû ji aliman dipirsî an jî berê xwe dida Ansîklopedîya Îslamê ji bo ku şayesa Bûraqa Hz. Mihemmed bi dest bixe. Tew ez behsa "[zarfli kilit, asmali kilit, surmeli kilit](#)" û nizanim hê çend celebên din yê miftayan ku nizanim bê Orhan Pamuk ji kû peyda kirine û anîne nakim ku bi tenê çilîngîrekî ku kurdîya wî xurt û bêhna wî fireh ku karibe guh bide pirsên me yê bêdawî bi navê wan bizanibe. Ji xwe di pêvajoya wergerê de yek ji wan pirsirêkên ku serên me diêşandin jî ev bû. Gava mirov romanekê dixwîne ew qasî guh nade van kîtekîtan, lê gava wê werdigerîne divê mîna neqqaşekî ku civateke ku ji aliyê Padîşêh ve jê hatiye xwastin çêdike tev bigere.

Orhan Pamûk mîna neqqaşekî nivîsandibû, Mistefa jî mîna neqqaşekî werdigerand û kirasê kurdî li romanê dikir. Gava qonaxa yekem ya wergera vê romanê bi dawî bû, ji bo qonaxa duyem ku me di nav xwe de jê re digot "dayina ber hev" an jî "miqayese" divîya ku du caran ez biçûma Stockholmê û carekê jî ew bihataya Parîsê. Bi xêra van çûyin û hatinan, piştî hîjdeh salên ku Mistefa bi tamamî ji malê qetiyabû û hevdîtina me ya deh sal berê ew jî gava ez hê şanzdeh salî bûm teva gelek dost û merivên din li Qamişloyê saetekê em li cem hev mabûn, ji nû ve me derfeta hevdîtinê û peydakirina wextên biratîya me yê ku ji destê me çûbûn bi dest xistibû. Di navbirên ku me dida danberheva wêsiyonên vê romanê yê tirkî, kurdî û carinan jî frensizî de, em dîsa bi pey "wextên biratîyê yê wendayî" diketin. Niha gava tê bîra min ku carinan weha dibû ku rojê şanzdeh saetan di nav hersê wêsiyonên romanê û ferhengên osmanî, tirkî, kurdî, frensizî û ingilîzî de em ji westanê û bêxewiyê ji hal de diketin, ez ji xwe re dibêjim "gelo wergêrên din jî ew qasî li ser vê romanê xebitîbûn?"

Carekê dîsa ji ber hevokeke bêînsaf ku me dikir û nedikir serrast nedibû, Mistefa gava lê niherî ku bêhna min teng dibe û êdî ez dixwazim hema zû bi zû xelas bikim, ji min re got, "ma xêr e, em ê ji bo çî bilezînin, ma eskeran daye dû

me?" û got, "werger bi sebrê dibe; mêrik bi sebrê nivîsandiyê, divê em jî wek bi sebrê wergerîn."

Dîsa di navbirekê de gava em li ser zehmetîya wergerê dipeyvîn, Mistefa di nav re got "werger hinerek e," û got "ez niha dikarim vê romanê di du mehan de jî beyî ku serê xwe pê re biêşînim wergerînim û tamam bikim, lê gava ku ew ê neşibe karekî baş û ne hêja be, ew ê ji çî re be? Hingê em ji bo çî werdigerîn? Ma mahneya karê me çî ye? Em dixwazin ku ev bibe wergerek an em dixwazin bi vê wergerê bedewî û dewlemendîya kurdî pêşkêşî xelkê bikin? Niha, heke em ê li şayesa Bûraqa Hz. Mihemed nepirsîn, bi kêmanî li ansîklopediyekê jî neniherin û weke ku me fahm kiriye wergerînin, hema divê em dev ji vî karî berdin û bibêjin ku werger ne karê me ye û ji xwe ev pirsgirêka Bûraqa Hz. Mihemed li ber yên din hêç e."

Mistefa li hin hêlên wergerê ku belkî yên din nikarin li xwe mikur werin jî mikur dihat. Her digot "carinan ez nizanim bê çawa dibe, lê hevokek weha derdikeve pêşîya min ku ez dikim û nakim ez nikarim tiştekî jê fahm bikim û ji nav derkevim. Lê belê divê ez wê hevokê wergerînim. Di têgihîştina min ya wergêrîyê de ew yek tune ye ku ez rabim û beyî ku wê hevokê fahm bikim wê wergerînim. Ji ber wê ez berî hertiştî li xwe mikur tîm ku ez di wê hêvokê de negihîştîme û bi dû re jî serê xwe bi baş têgihîştina wê re diêşînim." Ji xwe wî ê bi dû re ev dîtina xwe têxistaya nivîseke xwe ya li ser wergerê jî.

Di wergera "Navê Min Sor e" de, Mistefa heta ku ji wî hat bala xwe da parastina şewaza Orhan Pamûkî û zimanê wî yê nivîskariyê ku wî dixwest di zimanê tirkî de pêk bînanîya. Pirsas ku "heke Orhan Pamûk bi xwe bi kurdî binivîsandaya, gelo wî ê kurdîyêke çawa bi kar bianîya?" di qonaxa ku me jê re digot "danberhev" de her gava ku hevokeke kompleks derdiket pêşîya me ji me re dibû mifteya derîyê bersivan. Belkî jî ji ber wê ye ku ev werger ew qasî bi derengî ket. Di wergerên wê yên din de ez bawer nakim ku ev taybetmendî hebe. Min bi tenê li frensîya wê niherîye, lê gava min dixwand, min digot qey min ne "Navê Min Sor e" lê tiştekî din dixwand. Mistefa debara xwe bi wergeran nake û ji ber wê mecbûr e hin karên din jî bike ku vê yekê jî kir ku werger bi tamamî bi derengî bikeve. Lê ji ber ku wî giringiyêke mezin dida vê wergerê, di ber hemû karan re bi pey gotinên kurdî diket ku karibe di wergera xwe de bi kar bîne. Êdî weha bûbû ku di qonaxa pêvajoya yekem ya wergerê de, te destê xwe têxistaya bêrikên çakê wî an jî çenteyê wî, dê peyvên ku êdî ji ber qedexeyên bi salan hew maye ku werin jibîrkirin û hema bi lez û bezê li ser kaxezinan hatine nivîsandin têtetana destê te. Rojekê qey gava bi hin hevalên xwe re li qahweyekê runiştî nin peyvekê peyda dike û hema bi lez li kaxezekê digere û dide pey peyvên din ku bi ya yekem re têtîlîya wan heye. Gava tiştekî peyda nake hema radihîje peçeteya ku bi fîncana qehweyê re jê re hatiye û li ser wê dinivîsîne. Ji min re digot ku bi dû re gava ji wê qehwexaneyê derketine hevalên wî jî xwestiyê wan peyvan ji xwe re bistînin û wî jî rabûye fotokopiyên wê peçeteyê kişandine û li wan belav kirine. Gava ku min ew peçeteya spî ku êdî rengê wê zer bûbû dît, min careke din fahm kir ku heçî kesê ku serê xwe bi zimanê kurdî re diêşîne, lêgerînerêkî bêxerîte ye ku daye pey xezîneyên wendayî. Qey ji ber wê ye ku dixwast hema hemû peyvên ku peyda kirine di devereke vê wergerê re rake.

Zimanê kurdî mîna hemû zimanan zimanekî xurt û dewlemend e, lê ji ber ku ev serê heystê salan e ku bikaranîn û bipêşvexistina wî hatiye qedexekirin, di warê nivîskî de bi qasî ku jê re divê nehatiye bikaranîn û hin peyvên wê tu nemaye ku bêne jibîrkirin. Ji lewre, wî jî, mîna ku gelek nivîskarên me yên din jî van deh salên dawîn weha dikin, heta ku ji wî hat xwast hevmaheyên peyvan yên ku li herêmên cuda têne bikaranîn peyda bike û her yekê ji wan bi kêmanî



hema carekê be jî di vê wergerê de bi kar bîne. Endametîya wî ya Civînên Kurmancî yê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ku ev panzdeh sal in her ji şeş mehan bi carekê pêk tînin û gelek zimannasên ku ji herêmên cuda cuda yê Kurdistanê tînin beşdar dibin, di vî warê de ji bo wî bû awantajeke mezin. Bi vî awayî wergera "Navê Min Sor e" ya ku di çar qonaxên ku me di nav xwe de ji wan re digot "wergera esil", "danberhev", "xwendina yekem" ku ji aliyê min ve hate kirin û "xwendina dawîn" ku ji aliyê wî ve hate kirin temam bû, ji bo me bû xebateke baş ku em karibin dewlemendîya zimanê kurdî pêşkeş bikin û îmkanên wê bi ziman û şêwaza Orhan Pamûkî biceribînin û ji xwe re ferhengeke şexsî çê bikin.

Mistefa bi xwe romannivîs e. Ji ber wergeran nikarîbû romana xwe ya ku ev demeke dirêj e ku ji min re behs dikir binivîsîndaya. Niha, dibêje "xelas, ev ya dawîn bû. Min ji çar nivîskarên bijarte ku her yek di warê xwe de bûye sembolek çar pirtûk û gernameyeke Kurdistanê wergerandin; ev besî min e." Ew bi romaneke baş û biserketî ku wergera wê bi rastî jî bi qasî nivîsandina wê zehmet bû dev ji wergêrîyê berdide. Êdî ew ê romanên xwe binivîsîne.

Niha, gava ez li kurdîya "Navê Min Sor e" diniherim û tînim bîra xwe ku Mistefa kedeke bi qasî nivîsandina du romanên lê daye, ez dikarim bi rehetî bibêjim ku wergereke bêhempa, biserketî û temam e. Min ji Orhan Pamûkî bi xwe re jî got:

"Hingî ew qasî biserketî ye, heke em nebêjin werger e û li ser nenivîsînin, em ê bikarin kesên ku hayê wan ji tirkîya wê nîne bi rehetî bixapînin û bibêjin ku Orhan Pamûkî ev roman bi kurdî nivîsandiye."

Paris, 12.11.2001